



BULTENA ÇANDINIYÊ YA HDP'Ê

ÇILE
2021/HEJMAR:1

	2019	2020	DANEYÊN DAWÎ ÇILE-2021
DÎ ÇANDINIYÊ DE HEJMARA ÎSTÎHDAMÊ YA MÊRAN	3062	3090	
DÎ ÇANDINIYÊ DE HEJMARA ÎSTÎHDAMÊ YA JÎNAN	2542	2199	
BUHAYÊ MAZOTÊ	6.01585 TL	6.32226 TL	6.58795 TL
DÎ ÇANDINIYÊ DE RÊJEYA KU ZÊDE BÛYE	%14.36	%8.12	
ENFLASYONA XWARÎNÊ	%20.76	%11.74	
UFE YA ÇANDINIYÊ	%22.74	%18.48	
SÎNORÊ BÎRÇÎBÛNÊ	2067 TL	2482 TL	
TUFE YA XWARÎNÊ	%19.54	%17.70	LÎ GORÎ MEHA ÇILEYA SALA PAR JÎ SEDÎ %8.11 ZÊDE BÛYE.

ÇAVKANÎ - TUİK

BI DESTXISTINA XWARÎNÊ MAFÊ MIROV E: ENFLASYON XÎZAN DIKE

Ji ber ku Tirkiye ji bo sewalvanî û çandiniyê razemenî û plansaziyan berfireh nake, ji ber zêdebûna buhaye dovîzê lêçûn û mesrefên rençberan bêtir zêde dike. Ji ber ku her roj buhayên tiştan zêde dibin, bêguman bandorê li ser buhayên xwarinê jî dike û nemaze jî malbatên xîzan ji bo pêwistiyên xwe yê xwarinê pêk bînin zehmetiyan dikişînin.

Bi salan e AKP bê plan û bê kontrol, bi îthalatê polîtîkayên çandiniyê bi pêş dixê û buhayê berhemên rençberan li zeviyê bi zehmetî 1 TL tê firotin û ev berheman bi 8-10 TL'eyan tê ser sifreyê. Ji ber buhabûn û mesrefên zêde rençberan dev ji çandiniyê berdan, li hembêrî zêdebûna enflasyonê neçar mane û mehkûmê feqiriyê hatine hiştin.

Li gorî meha kanûnê ya sala 2020'an salane rêjeya serfkar gihişt ji sedî 14,6 û zêdebûna buhayên xwarinan gihişt ji sedî 20,6 û Tirkiye di nav welatên mezin dibin de piştî Arjantinê di rêza duyemîn de cih girt û di nav Teşkilata Pêşveçûn u Hevkariya Kar a Aboriyê (OECD) de bû yekemîn. Li gorî daneyên OECD'ê li seranserê cîhane şampiyonê enflasyonê Arjantîn e. Di meha çileyê ya sala 2020'an de li arjantinê de enflasyona serfkarîyê bi salane gihiştîye ji sedî 35,8 û zêdebûna buhayê xwarinan jî gihiştîye ji sedî 40,4.

Li seranserê cîhanê buhayê xwarinan li gel ku di sala 2011'an de derketiye lutkeyê, di 10 salên dawîn de ji sedî 17 kêmbûye lê dijberî vê yekê li Tirkiyeyê zêdebûn nîşan dide ku polîtîkayên çandiniyê yên AKP'ê şaş in. Li gorî daneyên FAO'yê di 7 mehên dawîn de buhayên xwarinê zêde bûye, lê li seranserê cîhanê buhayê xwarinê li dijî lûtkeya buhabûnê ya sala 2011'an, di 10 salên dawîn de ji sedî 17 kêmbûye, lê li Tirkiyeyê ji sedî 225 zêde bûye.

Ji ber ku Tirkiye ji bo pêşvebirina çandînî û sewalkariyê plansaziyên berfireh pêk nayne û razemeniyê nake, jixwe lêçûn pir zêde ne û ger zêdebûna buhayên dovîzê jî li ser zêde bibe, wê demê bi desxistina xwarinên bingehîn roj bi roj zehmetir dibe. Ger pirsgerêkên heyî yên qada çandiniyê ji binî ve neyên çareserkerin û ji bo razemeniya xwarinê plansaziyên nû neyên kirin di firotinên tanzîm de dê welatî ji bo kirinê bikevin rêzê.

Li şûna ku razemeniya herêmî bi pêş bixin û hilberîner û rençberan biparêzin û polîtîkayên çandiniyê bi pêş bixin, polîtîkayên neolîberal ên girêdayî derveyî welat bi pêş dixin û bi vî avahiyê pirsgerêkên çandiniyê mezintir dikin. Her wiha di nav polîtîkayên aboriyê yên giştî de girîngiyê nadin sektora çandiniyê û ji ber vê yekê pirsgerêkên çandiniyê ku bûye wek girêk çareser nabin û bêguman ev jî dibe sedem ku buhayê xwarinan zêdetir bibe.

Ligel pirsgerêkên çandiniyê yên heyî ji ber nexweşî û zuwabûnê û di ser de jî polîtîkayên xirab ên AKP'ê enflasyona xwarinê her ku diçe mezintir dibe. Ji ber ku enflasyona xwarinê zêde ye, ev yek herî zêde bandorê li welatîyên feqîr û xîzan dike û bandorê li welatîyên ku ji ber nexweşîya pandemiya ji kar derketine dike.

LI CÎHANÊ ENFLASYONA XWARINÊ KÊM DIBE LI TIRKIYÊ ZÊDE DIBE

Di dema ku li seranserê dinyayê buhayê xwarinê kêm bûye, li Tirkiyeyê enflasyona xurekan zêde dibe. Ev ferqa mezin ya di navbera enflasyona navnetewî û ya Tirkiyeyê de di van mehên pendamiyê de bêtir zêde bû û wiha xuyaye ku dê berfirehtir bibe. Bi derketina vê rewşê re dema ku Tirkiyeyê hawirdeya xurekan dike û li aliyekî din jî bi zêdebûna buhayê dolar di dema pandemiyê de roleke aktîf di vê rewşê de lîstiyê.

Bi destpêkirina pandemiyê re desthilata AKP-MHP guh neda hişyariyên ku ji alî HDP'ê û rêxistinên cotkaran ve hatin kirin û di encama polîtîkayên desthilatdariyê yên şaş de welatî di nava buhabûnê de dijîn û cotkar guihan asteke ku dest ji hilberînê berdin.

Rêxistina Xurek û Çandiniyê ya Neteweyên Yekbûyî endeksa buhayê xurekan ya di meha gulanê bi meha beriya wê re daye ber hev û li gorî wê yekê 3,1 puan bi paş ketiye. Ev jî îşaret bi wê yekê dike ku ji kanûna 2018'an de ev daneya mehane ya herî kême.

Dema ku mirov bala xwe bide guhertinên salane tê xuyakirin ku enflasyona xureka cîhanê kême bûye. Li gorî daneyên rêxistina Xurek û Çandiniyê ya Neteweyên Yekbûyî dema mirov daneyên di meha nîsana sala borî de bide ber daneyên heman mehê yên îsal de di enflasyona xurekan de ji sedî 6,5 paşketin heye.

BUHAYÊ GUBREYÊ NAXIN BIN KONTROLÊ

Buhayê gubreyê ji nişkan ve zêde bû û tevî ketina dolaran jî buhayê gubreyê nehate xwar. Ji bo pêşgirtina li vê buhabûnê Berdevkê Komisyona Çandiniyê yê HDP'ê, parlementerê Mêrsinê Rıdvan Turan bi daxuyaniyeke nivîskî bal kişand ser vê mijarê.

"Dema ku dolar bû 8,50 TL buhayê gubreyê bi azot 2 hezar û 400 TL bû, Tevî ku doilar daket û bû 7,40 TL lê buhayê gubreyê daneket lê berevajî wê yekê buhayê gubreyê bi azot derkete tonê wî bû zêdeyî 3 hezar TL û hê jî zêdetir dibe.

Ji aliyekî din ve buhayê gubreyê di sala dawî de derdora ji sedî 90 zêde bûye. Di nava 5 celebên gubreyê yê ku herî zêde cotkar bikar tînin de di sala dawî de buhayê wan gubreyan di navbera ji sedî 53 û heta ji sedî 87'an zêde bûye. Gubreyê Ure ku di 20'ê çileyê 2020'an de tona wê bi 1,650 TL/ bû, di 21'ê çileyê 2021'an de ji sedî 82 zêde bû û buhayê tona wê bû derdora 3 hezar TL. Ev buhayê zêde yê gubreyê hilberîner xistin nava fikirên mezin de.

Divê ku Kooperatifên Krediyê ya Çandiniyê yê ku bazirganiya ji sedî derdora 30 ji vê hilberînê dikin, destê xwe deynin ser vê rewşê û destwerdanê bikin û ew yek dibe sedema enflasyona xurekan. Li hemberî enflasyona xurekan hem hilberîner û hem berxur raste rast bandor li wan dibe û mexdûr dibin."

ZÊDEBÛNA XUREKÊN BINGEHÎN XIZANIYÊ JÎ ZÊDE DIKE

Yek ji sedemên bingehîn ên zêdebûna enflasyonê jî zêdebûna buhayê xurekan e. Di daxuniya daneyên enflasyonê yên mehane de, 20 berhemên ku di rêza pêşî ya buhabûnê de cih digirin zêdeyî nêvê wan madeyên xurekê ne û berhemên xurekê di rêza herî serî ya buhabûnê de cih digirin.

Dema ku mirov bala xwe bide zêdebûna buhayê hilberînan bingehîn yê sala dawî; buhayê birinc û arvan mehane ji sedî 1 zêdetir e û di sala dawîn de buhayê van xwarinan ji sedî 32,5 zêde bûye.

Ger mirov buhayên beqliyatan lêkolîn bike encameke wiha derdikeve holê; di sala dawîn de buhayê fasuleyên hişk ji sedî 34,1 zêde bûye, buhayê nîsk ji sedî 59, buhayê nok ji sedî 17 û bi giştî buhayê beqliyatan ji sedî 39 zêde bûye.

Buhayê goştê conega û noginan ji sedî 12,5, buhayê goştê berxan ji sedî 19,5, buhayê goştê mirîşkan ji sedî 29,3, buhayê masiyan ji sedî 36 zêde bûne.

Her çiqas buhayê hêk mehane ji sedî 4,3 kêr bûbe jî salane buhayê hêkan ji sedî 67 zêde bûye.

Buhayê rûnên nebatan mehane di navbera ji sedî 2,5 û 4'an de zêde bûye. Bi salane buhayê rûnê gulberojan ji sedî 53,7, rûnê garis ji sedî 53, rûnê hişk (margarîn) ji sedî 50,7, rûnê zeytê jî ji sedî 31 zêde bûne.

Ji ber zêdebûna buhayên û bilindbûna enflasyonê lêçûnên malbatên xîzan ku ji sedî 60'ê lêçûnên wan ji bo van van mezaxiyan tê xerckirin barê malbatên xîzan girantir dibe. Dema mirov lêçûnên xwarinan û li ser esasê mesrefên malbatan hesab bike lêçûna malbateke ku ji 4 kesan pêk tê derdikeve 8 hezar û 570 TL. Meaşê herî kêr (asgari ücret) jî 3 qatan binê sînore xîzaniyê ye û li Tirkiyeye nêzî 10 milyon kes meaşê herî kêr werdigirin û bi milyonan kes jî bêkar in û di rewşeke wiha de evqas zêdebûna buhayên xwarinan xîzaniyê zêdetir dike û pirsgirêkan girantir dike.

BUHAYÊ ŞÎR ZÊDE NABE LÊ BUHAYÊ HILBERÎNÊN ŞÎR ZÊDE DIBE

Ji aliyê Konseya Neteweyî ya Şîr ve ji 15'ê mijdara 2019'an heta 1'ê çileyê 2020'an buhayê şîr bi 2,30 TL'yê sabît hat hiştin. Lê di van deman de buhayê êm ji sedî 60 zêde bû û lêçûnên ji bo bidestxistina şîr jî ji sedî 40 zêde bû.

HDP ÇI DIBÊJE?

Di çandîniyê de bêdaletî heye û ji bo ev bêdaletî ji holê rabe divê plansaziyeke 5 salan were amadekirin.

Ji ber polîtîkayên şaş ên AKP'e, berhevkerinên çandiniyê digihêje ber destê sermayedaran û li aliyê din jî dibe sedem ku gel ji cotkariyê dûr bikeve. Derketiye holê ku buhayê hilberînên ku Tirkiye ji derveyî welat tên kirin zêde ne û hewldana pîrsgirêkan bi îthalatê ve çareserkerin dibe sedem ku dewlemend bêtir dewlemend bibin.

Li Tirkiyeyê cotkarî bi dijberiya cotkaran tê kirin û newekheviyeke mezin heye. Di çandiniyê de berpirsyarê newekheviyê AKP ye û sedema newekheviyê ew e ku AKP qezenca zêde wekî rêgezeke bingehîn dixê meriyetê.

Em hêj dereng neman! Ev dikarin rewşa cotkariya xirab ya Tirkiyeyê ji vê rewşê derxin û rizgar bikin. Em dikarin bi wekheviya cotkarên ku kedeke mezin hilberîne dikin ve dest bi sererastkirina şaşiyên bikin.

Ji hilberîne heta mezaxiyê divê li hemû qadan de kooperatîfî were bi pêşxistin, divê navbeynkar, sîmsar, tucar, komîsyonên ku tên wergirtin, hemû bac û buhayên hilberînan li gorî berjewendiyên cotkaran werin sererastkirin.

Hemû merheleyên hilberînê bi destê kooperatîfan bên kirin û ji bo vê yekê sererastkirinên qanûnî bên kirin

Lazim e deynê cotkarên biçûk dewlet bigire ser xwe.

Divê rêveberiyên herêmî ji bo cotkarên biçûk hilberînên xwe li bazarên semtan bifiroşe derfetan biafirîne û li gorî wan cih çêke.

Divê piştgirî herî kêr bi periyotên 5 salan werin dayîn, piştgirî ne ji bo zeviyan divê ji bo hilberîn û cotkar werin dayîn.

Divê piştgiriya ceryan û gaza xwezayî werin dayîn.

Bi boneya pandemiyê divê hîbe (alîkarî) were dayîn.

Ji bo di teknolojiya çandîniyê de girêdana derveyî welat bi dawî bibe divê dev ji polîtîkayên neolîberal berdin.

Li gundan ji bo hilberîn zêde bibe divê teşfîk bidin cotkaran û bi kêmkirina bacê piştgiriye bidin cotkaran.

HDP Genel Merkezi; Barbaros Mh
Tahran Cd Büklüm Sk No:117
Kavaklıdere/Çankaya ANKARA
Tel: 0312 427 17 80
Fax: 0312 428 89 57



@HDPgenelmerkezi



www.hdp.org.tr

